TIXMÊN EDEBÎ Û RENGÊN WAN

Wergerandin û berhevkirin:

Bavê Nazê

Ji mêj ve rûniştinek heye ku berhemên wêjeyî, di bin sîwana sê koman dicivin. Ji van koman re tixmên edebî têne gotin. Tevî ku ne her nivîserek li gel vê dabeşkirinê ye jî, lê her vê tiyoriyê ciyê xwe girtiye.

Ji xwe, ji me nase ku hîn di heyamê Yûnana kevnar e de, li ser dabeşkirina edeb li ser tixman, feylesof û hizirvan mijûlî vê pirsê dibin. Ew jî, li ser zimanê Sokratî, di pirtûka Eflaton de "Dewlet" tête gotin.

Sokrat bi vê wateyê li ser tixmên edebî diaxive: şair dikar direct(seranser) li ser zimanê xwe û bi navê xwe bibêje, ev jî, bi piranî di "divirambê" de ye. Em jî pê dizanin ku ev diyardeya edebî di lîrîkê de ye, an ku ji rewiştên wê yên bingehîn in.

Ev yek,

Ya du yê; Nivîser (efirener) berhemê xwe, bi tûnê (şêweyê) axavtina qehremanan li gel hev, ava dike, ev jî bi piranî di tirajediya û kenidiyayê de peyda dibe. Ev jî destnîşanek bû, ji bo diramayê.

Ya siyemîn; Efirener (nivîser) bêjeyên xwe, bi yên kesên din re di hindirê berhemê de, derbas dike. Mebest bi bêjeyên nivîser ew e, ku dema axavtinên qeremanan, radiwestîne, bi xwe, rewşê şîrove dike.

Weku em dibînin, tixmên siyemîn "epos" li dev Eflaton wek du tixmên têkel hatiye danasîn. Çima du tixmên têkel,? Ji aliyekê qehremanan li ser bûyeran, bi riya gotebêje axavtîne(ev jî reweştek ji yên dirama ye) û li ser zimanê nivîser axaftin (ev jî, ji rewiştên lîrîkayê ye.)

Ev nêrîne Eflatonî ku li ser zimanê Sokratî hatiye gotin, nêzî wê em li dev Arîsto jî dibînin. Di beşê sêyemîn de ji "Hunerê şîirê" de, Arîsto sê riyên lasayekirinê destnîşan dike. Ev jî di cewherê xwe de, ji bo êposê, lîrîkê û diramê destnîşan in. Ew dibêje; mihakata vê yekê yan jî wê yekê dibe, dema qisekirin li ser bûyerê ne li ser zimanê nivîser çê dibe. Ev haletek e. Halitê duyê jî, dema mihakat xwe bi xwe dimîne, yan jî kesên kirinê bi xwe dilivin û diaxivin.

Di qonaxa "vejînê" de, ev

siyemîna Arîsto ji danasîna tixmên edebî, bûne sê binax ji bo tixmên edebî yên vê qonaxê. Ew bi vî rengî dihatin bi nav kirin:

1- Êpos, 2- Melîka (anku lîrîka) 3- Edeba şanoyî(anku dirama). Ji xwe, ji van nerîn û ravekirinan li ser dabeşkirina edeb, tayên tixman gihiştin sedsalên 18 ê û 19 an û dûre bûne ciyên rûniştinê.

Ev standart, ji bo tixmanên edebî ev bûn; êpos, lîrîk û dirama.

Lê belê, tevî weha jî, destpêka sedsala 19 an (destpêkê di êstêtîkê romansî de)rûniştineke ji tixmên edebî re çê bû.

Wek şêwazeke hunerê bêjeyê li wan hate nerîn, lê wek naverokek hunerî di ber çavan re, hate derbaskirin. Bi gotineke din, dabeşkirina edeb, li ser bingehê babet û naverokê derbas bû. Di vî warî de, nerîna Şêling balkêş e. Ewî lîrîka bi giyanê aza yê bê sînor girêda, êpos jî bi gerikiyê ve û drama ewî wek tixmek têkel ji qanûnên aza û gerekiye pêk tê, anku ji tekoşîna azadiyê û gerikiyê bi hev re.

Lê Hîgil, bi nûkariyê katîgorên (meqole) "objektê" û "sûbjektê"tixmên edebî dabeşî ser êposê, lîrîkayê û dramê kir. Ewî digot, lîrîka subjektîve, lê êpos objectîve û dirama ji her du destpêkan çê dibe, anku ji lîrîkayê û êposê.

Di sedsala 20 an de, dabeşkirina edeb li ser tixmên edebî, ji layê derûnî ve lê hate nerîn. Ew bi halitê bîranîn, heyecan û tesewir, hate gerandin.

Zimanas jî, ji vê pirsê xwe bi dûr nexistin, ewan jî lîrîka bi dêmenê yekê (ez) girêdan, dêmenê duyê (tu) bi drama û yê siyem(ew) bi êposê. Her weha jî bi dema lêkerê ve jî, girêdanek çê kirin. Êpos, weku dema rabordeyî, lîrîka dema niho û dirama dema paşerojê. Di lîrîkayê de wek ew dibînin, di prosesê dînokî gelek nerînên corbecor, li ser tixmên edebî hatine gotin. Lê tevî weha jî, her danîna Eflatonî û Arîstoyî, ji bo tixmên edebî, her mane bingeh û ciyê lênêrînê.

Di vir de, pêwîst e bête nîşankirin ku ew nerîna ku edeb li ser bingehê nexşane û helbestê dabeşî ser tixman dike, ne di ciyê xwe de ye û şaş e. Weku nimûne, çawa dirama û êpos bi nexşan ve dikarin bêne efirandin, weha jî bi şîrê.

Dibe ku pirsek bête kirin, çima ev têrmênên tixman, ne bi kurdî ye? Pirs di ciyê xwe de ye, ji ber vê çendê emê li ser wateya wan ya ferhengî, hinekî rawestin:

Epos: Bêjeyeke Yûnanî ye, wateya bêjeyê yan ji gotinê distîne. Bi wateya xwe ya fireh bi edeba destanî têtе nasîn.

Lîrîka – Ew jî bêjeyeke yûnanî ye ku jê re dihête gotin lîra. Lîre jî alavek mûsîqî bû ku di ber re stiran (helbest) dihatin gotin. Wateya wê fireh helbest bi giştî.

Dirama- Bêjeyeke yûnanî ye ku wateya kirin bi livînê distîne. Bi wateya xwe ya fireh hemû rengên edeba şanoyî distîne.